Bangê Têhelandinê

Xalid Elî Silêvanî

Were xewnê û bêhna xewnan
Bo balgehê xwe bihêle
çavên şevê kil bide
Bi rejûya hesîyên
Ezmûneka xilole...
Eve tuxûbên navê min
Yên têhna te dimêjn
Dengê min yê rêka te
Bi hedarê buyax diket..
Rûs were û cilên penaberîyê
Di nav tabûta xerîbîyê li sinorî
Bin ax bike..
Hemû gunehên te heyn
Bi gulava hembêzbûna lêvên min bişû..
Bi lez were
Du çengên elhoyekî qer bike
çunku dem yê diqurmiçit
Benkê daverista vegeryanê
Hêdî hêdî yê dipiçit.. û
Ez.. ax ez..!
Yê li ser çavên du gunehan
Nivêja xwe ya nexrî û dumahîyê
dipêçim..
Ji bîr nekî ji berî tu bihêy
şûna hemû maçên hîz
ji herdu lêvên xwe bi daqute..!